

**Dumahîk : 51saliya ...**

hatiye guhartin , jiyan û berjewendiya xelkê me yê kurd li Sûriyê baştir hatiye zelalkirin ku , ew parek ji jiyan û berjewendiya civaka Sûrî ye û çendî heyameke erênî , şaristanî , mirovane û demokratîk li Sûriyê peyda bibe , ewqas rê li ber xebata kurd vedibe , û çareserkirina pirsê kurd a netewî bi şêweyê demokratîk û aştiyane nêzîk dibe . Lewre jî , mirov di wê baweriyê de ye ku , li gor vê dema nû û evqas guhartinên mezin û bingeîn ên ku di hemî waran de hatine

holê , pêdivî , pêwîstî û gerekiyêke dîrokî ye ku , hemî rewşenbîr , rêxistin û partiyên siyasî li xwe û programên xwe vegezin , da ku bi mêjiyekî vekirî , bi nêrîneke rexneyî , bê tirs û dudilî bifikirin û li nêrînên xwe bi azadî bibine xwedî ...Gelo partiyeke kurd li Sûriyê divê hebe an ne ? . Ew dê karibe çi bike û çi biserxîne û bi çi şêweyî bixebite ? . Da ku bi rastî karibe bi parêzerê berjewendî û rûmeta gelê xwe be , ne çi durîşiman hilde an gotinên mezin û qelew bike **Sînorê Yekta**

\*\*\*\*\*

**Dumahîk : Hevpeyvîn....**

Şik nîne ku divê hemû tevgerên beşên Kurdistanê ji hev re bibin alîkar. Lê divê ev alîkariya baş bê sînor kirin. Rojavayê Kurdistanê her dem ji bo beşên Kurdistanê fedekariyên mezin kiriye. Ez jî 7 salan li Rojavayê Kurdistanê mam. Ez rewşa kurdên Rojavayê Kurdistanê baş nas dikim. Ez fedekariya wan baş dizanim û ji bona vê Rojavayê Kurdistanê ji bona min xwediyê taybetiyekê ye.

Tevgera Rojavayê Kurdistanê piştî serîhildana 11-ê Adara 2004-an, hat merheleyê girîng. Ji bona vê divê hûn giranî bidin xebata xwe. Lewra sîstem û rejîma Suriyeyê mecbûr e ku bê guhertin.

Divê em guhertinên li dinyayê, li herêmê, li Kurdistanê pêk tînin bişopînin û wan fahm bikin. Ji van guhertinan ders derxin.

**Bakurê Kurdistanê/Amed, 14. 06. 2008brahîm GUÇLU**

*Sipas birêz Ibrahîm Guçlu, hêviya serkeftinê ji gelê kurd re dikin*

*6-Hun dixwazin çi xwendevanên kurd re*

**li ser rûpelên NEWROZê bêjin?.**

**6-** Ez, di destpêkê de ji bona gelê me li Rojavayê Kurdistanê û xwendevanên **Newrozê** serkeftinê dixwazim. Welatê me bi destê dewletên kolonyalist hatiye parçe kirin. Ji bona vê em mecbûr bûne ku jiyaneke ji hevûdu cihê bimeşînin û welatê me jî bûye kolonî. Gelê me ji hemû mafên xwe yên grubî yên neteweyî (Başurê Kurdistanê ne tê de) bêpar e.

Ev rewşa parçebûna welatê me bûye sedem ku li her beşeka Kurdistanê têkoşînek û stratejiyêke cihê bê meşandin. Ev jî tiştê gelek xwezayî ye. Divê em li her parçeyekê giraniyê bidin ser xebata xwe. Em nebêjin ku pêşî em parçeyêke din azad bikin, pişt re parçeya xwe azad bikin. Di van salên dawî li Rojavayê Kurdistanê di vê pirsê de xeletiyên gelek stratejîk hatin kirin, ciwan û rewşenbîrên Rojhilata Kurdistanê dev ji xebata xwe ya li Rojavayê Kurdistanê berdan, beşdarî xebata Bakurê Kurdistanê bûn. Divê ji vê şaşiyê dev bê berdan.